Kurmanji Roman - Agape Nivîsarên Pîroz - God's Love Letter Scriptures

Yûhenna 15:9 «Wek ku Bav ji min hez dike, ez jî wusa ji we hez dikim. Di hezkirina min de bimînin.
Îşaya 43:1,2 - Efesî 2:10 Çimkî em berhema Xwedê ne û em bi Mesîh Îsa hatine afirandin, da ku em di van karên qenc ên ku Xwedê ji pêşî ve amade kirine de, rê ve herin.
Yêremya 1:5 - Galatî 1:15 Lê hê ku ez di malzaroka diya xwe de bûm, Xwedê ez veqetandim û bi kerema xwe gazî min kir.
Yûhenna 15:16 Ne we ez hilbijartim, lê min hûn hilbijartin û kifş kirin, da ku hûn herin fêkî bidin û fêkiyê we bimîne. Hingê hûn bi navê min çi ji Bav bixwazin ewê bide we.
3 Yûhenna III. 1:2 Hezkiriyo, wek ku canê te di rihetiyê de ye, ez dua dikim ku tu di hemû tiştan de di rihetî û di saxiyê de bî.
Îşaya 43:4 - 1 Petrûs I. 2:9,10 Lê hûn «nifşekî* bijartî, kahînên Padîşahiyê, miletekî pîroz û gelê Xwedê bi xwe ne, da ku hûn karên wî yên hêjabilind bidin bihîstin.» Wî, hûn ji tariyê gazî ronahiya xwe ya nedîtî kirine. 10 Demekê hûn ne gel bûn, Lê niha hûn gelê Xwedê ne. Demekê rehm li we nebûbû, Lê niha rehm li we bûye.
Yêremya 31:3 - Efesî 1:4 Wî em ji beriya damezrandina dinyayê bi Mesîh bijartin, da ku em li ber wî di hezkirinê de pîroz û bêleke bin.
2 Tîmotêyos II. 1:9 Xwedê em xilas kirin, Û ji bo pîroziyê gazî me kir Ne ji ber kirinên me, Lê li gor mebest û kerema xwe. Ev kerem bi destê Mesîh Îsa, Ji beriya destpêka deman ve ji me re hat dayîn.
Yûhenna 3:16 Çimkî Xwedê wusa ji dinyayê hez kir ku Kurê xwe yê yekta da, da her kesê ku baweriyê bi wî bîne helak nebe, lê jiyana wî ya herheyî hebe.
Hoşêya 11:8; Îşaya 49:15,16; & Îşaya 41:13,14
Lûqa 12:32 Ya keriyê biçûk, netirse, çimkî li Bavê we xweş hat ku Padîşahiyê bide we.
Mettea 28:20 hemû tiştên ku min li we emir kirine, hînî wan bikin, da ku pêk bînin. Va ye, ez herdem heta dawiya dinyayê bi we re me.»
Yûhenna 14:1 «Bila dilê we reht nebe. Baweriya xwe bi Xwedê bînin û baweriya xwe bi min jî bînin.
Zebûr 23:1-6 Xudan şivanê min e, Çênabe kêmahiya min. 2 Min vedizelîne li ser mêrgên şîn, Li qeraxên avên aram, min dide meşîn. 3 Teze dike canê min, Bi saya navê xwe min di riyên rast de dide meşîn. 4 Ez di newala mirinê ya tarî re derbas bim jî, Natirsim ji xerabiyê. Çimkî tu bi min re yî, tu yî li ba min. Çoyê te, darê te rihetiyê dide min. 5 Li pêş dijminên min tu ji min re datînî sifrê, Û tu bi rûn dikî serê min, Difûre kasa min. 6 Wê di hemû jîna min de, Qencî û kerem li pey min bimeşe. Û ezê hergav di mala Xudan de rûnêm.

Filîpî 4:7 Û aştiya Xwedê ya ku di ser her têgihîştinê re ye, wê dilê we û hişê we bi Mesîh Îsa biparêze.
Gotinên Silêman 3:24 - Zebûr 4:8 Ezê bi aştî xwe vezelînim û rakevim, Çimkî tenê tu, ya Xudan, Di ewlehiyê de min didî rûniştin.
Yûhenna 14:27 «Ez aştiyê* ji we re dihêlim; ez aştiya xwe didim we. Ez wek ku dinya dide we nadim. Bila dilê we reht nebe û netirsin!
Zebûr 33:18 Belê çavê Xudan li ser wan e ku ji wî ditirsin, Li ser wan e ku hêviya xwe bi kerema wî ve girê didin;
Romayî 5:2 Bi saya wî em bi baweriyê gihîştine vê kerema ku em tê de sekinî ne. Û em bi hêviya rûmeta ku Xwedê wê bide, pesnê xwe didin.
Îşaya 55:12 - Lûqa 19:40 Îsa li wan vegerand û got: «Ez ji we re dibêjim: Eger ew bêpêjin bimînin, kevir wê dengê xwe hildin.»
Yûhenna 16:22 Niha hûn jî xemgîn in, lê ezê we dîsa bibînim û dilê we wê bi şahiyê tije bibe. Û tu kes vê şahiya we ji we nastîne.
Lûqa 12:9 lê yê ku min li ber mirovan înkar bike, ewê li ber milyaketên Xwedê bê înkarkirin.
Mettea 10:30 Heçî hûn in, mûyên serê we jî hemû hejmartî ne.
Îşaya 54:10 - Mettea 24:35 Erd û ezman wê bibihûrin, lê peyvên min tu caran nabihûrin.
Mettea 11:28-30 «Werin ba min, ey hemû yên westayî û bargiran, ezê rihetiyê bidim we. 29 Nîrê min deynin ser stûyê xwe û ji min hîn bibin, çimkî ez nerm û ji dil nefsbiçûk im û hûnê rihetiyê ji bo canê xwe bibînin. 30 Çimkî nîrê min hêsanî û barê min sivik e.»
Silêman 2:10 & Hoşêya 2:14,19,20
2 Korîntî II. 11:2 Ez bi hesûdiya Xwedê ji bo we hesûd im, çimkî min hûn ji mêrekî tenê re, ji Mesîh re nîşan kirin, da ku ez we wek keçikeke pak pêşkêşî wî bikim.
Derketin 3:14 - Îbranî 13:8 Îsa Mesîh, duh, îro û her û her eynî ye.
Hoşêya 13:4 - Karên Şandiyan 4:12 Xilasî bi tu kesî din tune; çimkî di bin ezmên de, di nav mirovan de, navekî din nehatiye dayîn ku em bikarin pê xilas bibin.»
Yûhenna 15:14 Eger hûn tiştên ku min li we emir kirin bînin cih, hûn dostên min in.
Yûhenna 14:6 Îsa ji wî re got: «Rê, rastî û jiyan ez im. Heta ku ne bi destê min be, tu kes nayê ba Bav.
Peyxama Yûhenna 3:20 Va ye, ez li ber derî radiwestim û lê dixim. Eger yek dengê min bibihîze û derî veke, ezê herim ba wî û ez bi wî re û ew bi min re, emê şîvê bixwin.

Pastor T. John Franklin
Church of Salvation, Healing, and Deliverance
COS-HAD.org